Utlendingsdirektoratet
Norwegian Directorate
of Immigration

# Qaideyên nav malê yên kempa penaberan

Wek rûniştvanê kempa penaberan, divê tu qaîdeyên nav malê bişopînî. Ew hatine nivîsandin da ku tu û rûniştvanên din jiyaneke ewledar û baş li kempê bijîn.

## 1 Bêdengî, nîzam û ewlehî

- Divê li kempê bêdengî hebe ji se’et 23.00 heta 06.00 an.
- Divê tu kesên din aciz nekî û bi awayekî ne baş li hember wan tevnegerî. Tundûtûjî (‘inf), xirakirin an jî sûcên din dê ji UDI re werin ragihandin, û wê giliyê kesên sûcdar li cem polîs were kirin.
- Divê tu li cihên mişterek (hevpar) meşrûbê venexwî.
- Divê tu cixare, nergîlê û cixareyên elektronî li cihên mişterek an jî li odeya xwe nekêşî.
- Destûr tune ku tu heywanên kedî li kempa penaberan vehewînî.
- Divê tu xwe hîn bikî ka divê tu çi bikî eger krîzek çêbibe an jî agir bi kempê bikeve.

## 2 Bikaranîna ode û amûran

- Divê tu odeyên mişterek û qada derve paqij bikî. Divê tu miqate bî ku bisîklet, erebokên zarokan û alav û hacetên din rêyên revê asteng nakin.
- Divê tu oda xwe paqij bikî û bidî hev.
- Divê tu gemara xwe ji çavkaniyê ji hev veqetînî û bavêjî sindoqên gemarê.
- Divê tu odeyên mişterek ên hundir bi rêkûpêkî paqij bikî. Lîsteyek hatiye çêkirin ku dide xuyakirin kengî dora te ya paqijkirinê ye. Dema ku dora te were, divê tu paqijiya lazim bikî.
- Divê tu makîneyên şuştinê, alavên metbexê û alavên şuştinê wekî çawa di pirtûkên bikarhêneran de hatiye, bikar bînî.

## 3 Serdanên şevê

- Divê tu her gav ji kempê bipirsê gelo tu dikarî mêvanên şevê vehewînî yan na.
- Kemp dikare ji vehewandina mêvanên şevê re bêje na.
- Ew kesê ku dê li cem te raze, divê li Norwêcê bijî û nasnameya xwe an jî kerta penaberan şanî karmendên kempa penaberan bike.
- Dema ku mêvanên te yên şevê hebin, divê hun rihetiya rûniştvanên din yên kempê li ber çavan bigirin.
- Tu bi xwe berpirsî ji dabînkirina xwarinê û nivînan ji mêvanên xwe re.
- Kesên mezin dikarin zarokên xwe, û heval û endamên malbatê yên ku li kempên penaberan yên din dijîn, bi şevê li cem xwe vehewînin.
- Zarokên di bin 18 salan de dikarin dêûbav, xwişk û birayên xwe û hevalên xwe yên hevtemen, bi şevê li cem xwe vehewînin.